

JÎYANA JINÊN DENG BÊJ JI ALÎYÊ ZAYENDA CIVAKÎ VE

TOPLUMSAL CİNSİYET YÖNÜYLE KADIN DENG BÊJLERİN HAYATI THE LIFE OF WOMEN DENG BÊJS IN TERMS OF GENDER

Leyla Kaplan*

Kurte

Zayend wekî têgih ji alîyê bîyolojîk ve jinbûn an jî mêrbûnê ra têkildar e lê zayenda civakî nasnameyên zayendî ne ku wan piştî bar û berpirsyarên civakî yên di wext û demên cuda da li ser jin û mêran hatine barkirin derdikevin holê. Em di zayendê da li ser cudahiyan bîyolojîk sekinîne lê di zayenda civakî da me cudahiyan ku bi rêya nîrxên civakî hatine çekirin destnîşan kirine. Wekî cureyekî pêşdarazîyê stereotîpên zayenda civakî tevger û taybetmendî ne ku civak wekî kom ji jin û meran hêvî dike. Stereotîp, di hemû çandan da ne wekî hev in û li hemberî guherînê li ber xwe didin. Di vê xebatê da jîyana jinên dengbêj ên navdar ên wekî Meryem Xan, Sûsika Simo, Fatma Îsa, Belga Qado, Zadîna Şekir û Aslika Qadir ji alîyê stereotîpên zayenda civakî ve hatiye vekolandin. Ji ber ku wextekî, gihîştina dengê jinê bo mêran nexweş dihat dîtin jinên dengbêj berdêlên giran dane û li hemberî stereotîpên civakî li ber xwe dane. Wekî encam hatiye dîtin ku jinên dengbêj/stranbêj hem di nav malbatê da hem jî di nav civakê da li hember stereotîpên zayenda civakî bi têkoşînê jîyana xwe borandine.

Bêjeyên Sereke: Zayend, zayenda civakî, stereotîp, jinên dengbêj/stranbêj, huner.

Öz

Terim olarak cinsiyet, biyolojik açıdan kadın ya da erkek olmakla ilgili iken; toplumsal cinsiyet, kadın ve erkeklere farklı yer ve zamanlarda yüklenen toplumsal yük ve sorumluluklar sonucu ortaya çıkan cinsiyet kimlikleridir. Cinsiyette biyolojik farklılıklara değinilirken toplumsal cinsiyette kültürel değerlerin oluşturduğu farklılıklara işaret edilir. Bir çeşit önyargı olan toplumsal cinsiyet kalıpyargıları ise toplumun bir grup olarak kadınlardan ve erkeklerden beklediği davranış ve özelliklerdir. Kültürden kültüre farklılık gösteren kalıpyargıları değişime karşı dirençlidir. Bu çalışmamızda bilinen kadın dengbejlerden/şarkıcılardan olan Meryem Han, Sûsika Simo, Fatma Îsa, Belga Kado, Zadîna Şekir ve Aslika Kadir'in hayatları toplumsal cinsiyet kalıpyargıları yönüyle incelenmiştir. Kadın sesinin erkeğe ulaşmasının hoş karşılanmadığı bir toplumda ve zamanda kadın dengbejler/şarkıcılar ağır bedeller ödeyerek toplumsal kalıpyargılara direnmişlerdir. Sonuç olarak görülmüştür ki kadın dengbejler/şarkıcılar hayatları boyunca hem aile hem de toplum içerisinde kalıpyargılarla mücadele etmek zorunda kalmışlardır.

Anahtar Kelimeler: Cinsiyet, toplumsal cinsiyet, kalıpyargı, kadın dengbejler/şarkıcılar, sanat.

Abstract

While sex, as a term, is related to being a biological woman or man, gender is the gender identities that emerge as a result of the social burdens and responsibilities placed on women and men at different places and times. While biological differences in gender are mentioned, differences created by cultural values in gender are pointed out. Gender stereotypes, which are a type of prejudice, are the behaviours and characteristics that society expects from women and men as a group. Stereotypes, which differ from culture to culture, are resistant to change. In this study, the lives of well-known female dengbejs (singers) Meryem Khan, Susika Simo, Fatma Isa, Belga Qado, Zadina Shekir and Aslika Qadir, were examined in terms of gender stereotypes. In a society and time where it was not welcome for women's voices to be heard by men, female dengbejs (singers) resisted social stereotypes by paying a heavy price. As a result, it has been seen that female dengbejs (singers) have had to struggle with stereotypes in both family and society throughout their lives.

Keywords: Sex, gender, stereotype, female dengbejs (singers), art.

Ev xebat di sempozyûma "Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Lisansüstü Öğrenci Sempozyumu" ya 7-8 Mîjdar 2023yan da wekî tebliğ hatiye pêşkêşkirin.

* Dr. Öğretim Görevlisi, Mardin Artuklu Üniversitesi, Edebiyat Fakültesi, Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü, leylakaplan@artuklu.edu.tr, ORCID: 0000-0001-7887-9017.

DESTPÊK

Her civak li gor bawerî, adet, çand û jiyana xwe ya rojane ji jin û mêran hin tevgeran hêvî dike. Ev tevger herçiqas bi zayenda mirovan ra bê têkildarkirin jî ya esil taybetmendiye çandî ne ku şêkil dide van daxwazan. Lewre di her civakê da daxwaz diguherin û bi demê ra nû dibin (Köşgeroğlu, 2010, r. 11). Jin û mêr van daxwazên civakî di xwe da nahevînin û ev daxwaz ji aliyê civakê ve tên ferzkirin. Civak ji jin û mêran exlebî daxwazên dijî hev hêvî dike. Li alîyekî nerm û sakînbûna jinan, li alîyê din jî hişk û livdarîya mêran tê pesinkirin. Girîn ji bo jinan wek tişteki pir normal tê dîtin lê girîna mêrekî dibe sebeba rexneyan. Ji jinan tê xwestin ku ew girêdayî malbat, hevjin û zarokên xwe bin, lê mêr çiqas azad bin ew qas baş tê dîtin. Mêr xwediyê milkîyetê ne, ev di dîn, siyaset û jiyana aborî da roleke aktîf dileyîzîn; jin divê zarokan bînin û wan mezin bikin, li nexweş û kal û pîrên xwe binêrin, karên malê bikin (Bhasin, 2015, r. 12). Bi vî awayî cihê jinan wek “qada taybet” yanî mal, xanî; cihê mêran jî “qada gelwarî”, yanî derve, cihên vekirî tê dîtin. Ev taybetmendî exlebî di civakên patrîyarkal da xwe didin nîşan. Çinku di civakên patrîyarkal da “aqilê” mêran ji yê jinan serdestir e. Jin bi “hest” ra mêr jî bi “aqil” ra tê têkildarkirin û ev rewş jî mêran bilind dike û jinan jî kêr dixê. Gelek caran mimkin nayê dîtin ku jin di mijarekê da gotineke rast bêje (Görücü Öner, 2021, r. 219). Ev bar û berpirsîyarên ku civak li ser mirovan ferz dike hem ji bo jinan hem jî ji bo mêran dibin sebeba acizbûnê.

Dengbêjî çandeke qedîm a kurdan e û bi sedsalan e hebûna xwe didomîne. Ev çand di nav nîşan da bi awayekî devkî belav bûye û hebûna xwe parastîye. Bi saya van dengbêjan îro gel ji destan, hîkayet, şer û pevçûn û çanda xwe agahdar dibe. Bûyer û qewimînên giring ên li ser civakê xwedî bandor in bûne mijarên kilaman û dengbêjan jî bi van mijaran kilamên xwe çêkirine. Dengbêjan van kilamên xwe di şahî û dawetan da, di diwanên axa û paşayan da, li mala malmezinên gundan da gotine û xwe gihandine kesên din. Ew gelek caran girêdayî cihekê nemane, gund bi gund gerîyane û li ser dengbêjîya xwe kilamên nû zêde kirine. Bi vî awayî ji devokên din agahdar bûne û bi rêya kilaman gel jî agahdar kirine. Dengbêjên mêr di vê mijarê de bişans bûne çinku jinan nekarine wek wan bi awayekî hêsan gund bi gund bigerin.

Dengbêjî ji aliyê zayenda civakî ve kêr caran bûye mijara lekolînan. Bi rêya vê xebatê me xwest ku jiyana şeş jinên dengbêj ji aliyê zayenda civakî ve, rol û stereotîpên zayendî ve binirxînin. Gelo van jinan ji bo pêkanîna vê hunerê kîjan zehmetî kêşandine? Ew mecbûr mane ku hin berdelan bidin an na? Em ê li ser van xalan bisekinin. Helbet xebatên bi vî rengî yên ji bo dengbêjên mêr jî pêwîst in û divê bên kirin.

1. Zayend, Zayenda Civakî û Stereotîpên Zayenda Civakî

Zayend, bi alîyê bîyolojîk ê mirovan ra eleqedar e û bi rêya zayendê, taybetmendî û cudahîyên fîzîkî yên mirovan tên diyarkirin. Li alîyê din di zayenda civakî da “civak” dikeve nav bûyerê û cudahîyên di navbera jin û mêran da ji alîyê civakê ve tên kategorîzekirin. Zayend bi anatomî û fîzyolojîyê ra eleqedar e. Zayenda civakî hêvî û daxwazên civak û çandê ne ku wekî kesayet ji jin û mêrî tên xwastin. Li gor Bingöl di çêbûna zayenda civakî da faktorên wekî patrîyarkî, sîstema pederşahî, malbat û kevneşopîyê xwedî bandor in (Bingöl, 2014, r.109). Bhasin di xebata xwe ya bi navê “Toplumsal Cinsiyet” (Zayenda Civakî) da cudahîyên sereke yên di navbera zayend û zayenda civakî da bi vî awayî rêz dike: zayend ji dayikbûnê tê, lê zayenda civakî diyardeyek e ku ji alîyê insanan ve hatîye afirandin; zayend naguhere û li her cihê heman e, zayenda civakî guherbar e û li gor çand, wext û malbatê diguhere; zayend nayê guhertin, zayenda civakî dikare bê guhertin (2015, r. 11).

Zayenda civakî rêya îfadekirina “avahîyên çandî” ye. Ji avahîyên çandî mebest ew e ku hemû rolên bi jin û mêran ra têkildar ji alîyê civakê ve hatine çêkirin (Çetin, 2017, r. 20). Di derketin û bicihbûna zayenda civakî da bandora “androstrîzm” û “mîzojînîzmê” heye. Androstrîzm, mêran dixê navendê û wekî model mêran qebûl dike. Mêr norma tevgerên insanan e. Di nav rêvebirî, huner û zanînê da cihê mêran ê navendî bi vî rewşê ra eleqedar e. Mîzojînîzm di yewnanî da tê wateya “dijminatîya jinan”. Kêmxistina jinan, têkildarkirina jinan bi dayikbûn û karên malê, şideta li ser jinan bi mîzojînîzmê ra eleqedar e (Pilpil Yöney, 2013, r. 62-63).

Sedema cudahiya di navbera jin û mêran da wekî anatomî hatîye destnîşankirin. Bi salan wisa hatîye bawerkirin ku taybetmendî, rol û statuyên li jin û mêran hatine barkirin nayên guherîn. Li gor wan, ev rewş rewşeka bîyolojîk û xwezayî ye, lewra guherîna wan ne mimkin e. Yanî statuya jinan ya li paş mêran bi jin û bedena jinê ra eleqedar e û ev nêrîn hêj jî didome. Dema rewş bi vî awayî wekî tiştekî xwezayî bê dîtin ew çax bêdaletî û newekhevîya di navbera jin û meran da jî tê normalîzekirin (Bhasin, 2015, r. 9). Li gorî Reed serdestîya jinê yan jî ya mêrî serdestîyeke bîyolojîk nîne. Ev serdestî ji alîyê dîrok û komelgehê ve hatiye avakirin. Raborîya vê serdestîyê heta çend sedsalên berê diçe. Serdestîya yekî/ê ji ya/ê din ewil ji alîyê komelgehê ve hatiye saz kirin paşê jî li ser wê hin mît hatine çêkirin. Reed azadîya jinê di rakirina vê têgihanê ku ji alîyê dîrok û komelgehê ve hatiye çêkirin da dibîne (Filiz, 2023, r. 310).

Hin taybetmendî û tevger hene ku civak wekî kom ji jin û mêran hêvî dikan, dixwazin. Ji van ra “stereotîpên zayendî” tê gotin. Taybetmendîyên kesayetîyê yên jinan wekî “femînen”, yên mêran jî wekî “maskulen” tê binavkirin. Tê xwastin ku jin divê xwedîyê taybetmendîyên wekî eleqedar, hestîyar, jidil; mêr jî bihêz, azad û serdest be. Taybetmendîyên jin û mêran her wekî li dijî hev in tê dîtin û guherîna wan stereotîpan jî ne hêsan e. Di gelek çandên cuda da taybetîyên

hevpar ên stereotîpan hene. Stereotîpên zayendî li gor nijad, temen û çîna civakî ya mirovan diguherin (Yaşın Dökmen, 2021, r. 104-112). Ev rol û stereotîpên zayenda civakî ji bo ji nû vehilberîna newekhevîyên çandî û têkilîyên hêzî wekî qadekê dikare bê nirxandin (Çetin & Kaplan, 2025: 55). Dîsa jî bi gelemperî dikare bê gotin ku ji jinan zeîfbûn, pasîfbûn, girêdayîbûn, hestiyarîbûn; ji mêran jî bihêzbûn, bêtirsîbûn, êrîşkar û azadbûn tê xwastin (Oğuz, 2019, r. 17).

Mirov dema tevî civakê dibin ewil hin stereotîp û jiberkirinan hîn dibin. Di têkilîyên civakî da bandora pêşdarazîyan gelek e (Çetin, 2020, 1139). Zayenda civakî hin rol û stereotîpan li jin û mêran bar dîkin. Ev rol hêj di zarokatîyê da dest pê dîkin. Dê û bav bi heman awayî bi wan ra naaxivin û tevnagerin. Bi demê ra tiştên bi zayenda wan ra eleqedar bala zarokan dikişin û meyla zarokan bi wî awayî dewam dike. Zarok li gor çand, bawerî û rewşa civaka xwe dirûv digirin (Suvağci, 2021, r. 763). Bo mînak kodkirina rengan ji bo zarokan dibe alîkar ku zarokên biçûk cudahîyên zayenda civakî hîn bibin. Bê guman di jîyana zarokên keç da rengê pembeyê, yê kur da jî hêşîn zêdetir cih digire (Fine, 2011, r. 211-222). Ev rewş bi standina pêlîstokên wan dewam dike. Ji bo zarokên kur bihereketbûn wekî tiştêkî normal tê dîtin lê heman tişt ji bo zarokên keç derbasdar nîne. Divê ew sakîn û aram bin. Piştî zarok mezin dibin êdî li gor zayenda wan karên ku dikarin bikin jî diguherin. Divê jin bi karên nav malê, mêr ji bi karên derveyê malê ra eleqedar bibin. Ev hêvî û daxwazên civakê li ser jîyana mirovan bi vî awayî her dem dewam dîkin.

2. Dengbêj û Dengbêjî

Dengbêj ew kes e ku rih dide deng û deng zindî dike; jîyan û nefesê dide deng; gotinê dineqîşîne û hostatîya kelim û kilamê dike (Uzun, 2017, r. 11-13). Piranî xwendin û nivîsandina dengbêjan tune ne û bi nirx û taybetmendîyên çanda devkî mezin bûne; ew xwedîyê deng û bîreka bihêz in û hikayetên gelêrî yê kurdî bi awayekî estetîk hin caran ligel amûrekê hin caran jî bê amûr li hember gel distrin (Parıltı, 2006, r. 64-65). Dengbêj ji civaka ku jê derketîye haydar e û guhdaran jî baş dinase. Lewra li gor bertekên wan, hunera xwe îcra dike. Hikayetên di hişê wî/ê da li gor hêvî û xwastekên civakî şewe digrin. Her tiştên bi jîyanê ra eleqedar dikarin bibin mijara kilamên dengbêjan: evîneka yekalî, evîneka dualî ya têkçûyî, hikayetên trajîk, şerên di navbera eşîr an jî gelan da, reqabeta ji bo hezkirîyê, xela, koçberî, dînguhertin hin ji van mijaran in.

Delikaya li ser berbelavîya cografîk a dengbêjîyê disekine û dibêje ku “Dengbêj, wekî term û têgeheke çanda devkî herî kêr ev du sedsal e li seranserê Serhedê, herwiha li derveyê sînorên Tirkîyeyê, Makû, Êrmîye û di nav kurmancên Ermenistanê û li bajarên wekî Çewlîg, Diyarbekir, Batman û Mêrdînê û dorhêla wan kêr-zêde tê bikaranîn” (Delikaya, 2025, r. 239). Li gor Pariltî, di nav kurdan da ji bo destpêkirina çanda dengbêjîyê dîrokeka teqez tune ye. Lê dema ku mirov li taybetmendîyên çandên devkî dinêre dibîne ku vegotin û guhdarîkirina hîkayetan wesfê mirovan ê sereke ye. Lewra dikare bê gotin ku di nav kurdan da piştî çêbûna çandê vegotina hîkayetan jî dest pê kirîye. Dengbêjan jî vî karî dane destpêkirin û zindî hiştine (Pariltî, 2006, r. 80). Keskin li ser performansa dengbêjîyê disekine û dibêje ku dengbêj û dengbêjî heta salên 1980î di nav civaka kurdan da cihekî giring digirt. Lê piştî pêşketinên teknolojîk û ji ber sedemên çandî, siyasî û civakî ev kevneşopî ber bi windabûnê ve çû. Piştî salên 2000î bi vekirina “mala dengbêjan” hem cihên performansê ya dengbêjan hem jî guhdarvan guherîn (Keskin, 2016, r. 61).

Di nav çanda dengbêjîyê da radyoyên kurdî cihekî giring digirin. Berî radyoyan dengbêjî bi sedsalan di nav têkilîya hoste-çirax da dewam kirîye lê di salên 1930î da Radyoya Bexdayê, 1940î da Radyoya Êrmîyeyê, 1950yî da Radyoya Êrîvanê bandoreka erênî li ser çanda dengbêjîyê û li ser dengbêjan kirine. Dengbêjan bi saya radyoyê li gelek dengbêjan guhdarî kirine, hînî gelek kîlamên nû bûne û kaset û plak derxistine (Keleş, 2019, r. 387). Li gor Yıldırımçakar (2020, r. 95) jinên dengbêj cara ewil bi saya van radyoyan dengbêjiya profesyonel îcra kirine.

Dengbêj ji ber karên xwe her tim di nav civatê da bûne û ji dawet û şahîyan kêr nemane (Delikaya & Ertekin, 2021, r.15). Ew gund bi gund, bajar bi bajar, herêm bi herêm gerîyane û tûrikên xwe yê kilaman tijî kirine. Ev rewş zêdetir bi dengbêjên mêr ra eleqedar e, lewra firsendeka jinan a gerê tune bûye. Kêr jinên dengbêj hene ku çûne li hember dengbêjên mêr kilam gotine. Bo mînak Êran Xanima Mucered¹ li dawetekê li hemberî dengbêj Zahiro û Şakiro kilam gotine. Lê li vir divê bê destnîşankirin ku Êran Xanim ji bo daweta qîza Emer Axa diçe gundê Enbî û ew xizmên hev in û Enbî gundekî nêzikî Êranê ye. Di heman demê da dengbêj

¹ Êran Xanim (Êran Mucered) di 1951an da li gundê Îçkeso li navçeya Somabiradostê ser bajarê Êrmîyeyê ji dayik bûye. Êran Xanim di zarokatîya xwe ve di dîwanan da stran gotine. Ew di 18 salîya xwe da digel Seîd Hesenzade dizewice û bi navê Gulistan, Mihendis û Canbexş zarokên wê çedibin. Êran Xan diçe radyoya Êrmîyeyê û li wir digel dengbêj Xalê Birê û Mistoyê bilûrvan stran dibêjin. Di sala 1971ê da li radyoya Êrmîyê bi awayekî fermî dest bi karê dengbêjîyê dike. Stranên wê bi piranî li ser evîn, xerîbî, keser û xemê ne. Êran Xanima dengbêj di sala 2001ê da li gorî rapora bijîjkan di encama xwexeniqandinê da jîyana xwe ji dest daye. Lê li gorî hin îdiayan jî ji aliyê nevisîyê xwe ve hatiye kuştin. Ji bo agahîyên zêdetir bnr. Xakpûr, 2023; Yaş, 2016, r. 377-378.

Zahiro û Şakiro jî ji bo dawetekê li gundê Hespistanê bûne. Ev gund girêdayî Qelqelî ye û gelek jî nêzikê gundê Enbî ye. Dengbêj Zahiro û Şakiro seh dîkin ku Îran Xanim hatiye, diçin ba wê û di heman civatê da kilam dibêjin. Îran Xanim li wir ji wan ra qala astengîyên li hemberê kilamgotina xwe dike û dibêje: “Îca bi malbatî asteng derket, şevêkê gazî min kirin civatek çêkirin, gotin tu çi dikî, çawa dikî, jin di huzûra mêran de kilaman bibêje eyb e” (Xakpûr, 2023, r. 57-59). Malbat dike û nake nikare Îran Xanim îqna bike û di dawîyê da destûr didin. Mîna keke din jî Gulêya Bavfile² ye û wê û Evdalê Zeynê di civatekê da avêtine ber hev. Lê tê zanîn ku Gulê dengbêja Surmeli Memed Paşa bûye û qîza keşîşê Filleyan bûye (Aras, 2013, r. 44). Di kilamgotina wê ya li hemberê mêran da ermenîbûna wê û Surmeli Memed Paşa bêguman bandor kirine. Çakmak (2024, r. 59) ji çavkanîyên devkî radigehîne ku Gulê û Pero yekem jinên dengbêj ên sedsala hijdehem in. Di sedsala nozdehem da Hemîde wekî dengbêjeka jin a navdar derbas dibe û tê zanîn ku li Colemêrgê jiyaye. Ev her sê jin di nav jinên dengbêj ên ewil da derbas dibin.

Jinên dengbêj bi çend awayan li kilaman guhdarî kirine. Yek ji wan, di nav malbatê da kesekî dengbêj hebûye -bi piranî bav dengbêj e- û bi vî şeklî li ew guhdarî kirîne û hînî kilamgotinê bûne, ya din jî bi rêya radyoyê li kilaman guhdarî kirine û paşê jî ew kilam ji ber kirine (Kaplan, 2024, r. 506). Ji bo dengbêjîyê wextê herî guncaw şevên zivistanê bûne. Loma li welatê me şevên zivistanê dirêj in û kar kêr in. Ev jî ji bo dengbêjan bûye wexta herî guncaw a kilamgotinê. Herçiqas hin dengbêjan ligel enstrumanekê kilamên xwe gotibin jî piranîya dengbêjan bê enstruman kilamên xwe gotine. Wan dengbêjan dengê xwe wekî enstruman bi kar anîne.

Dengbêj gund bi gund gerîyane, beşdarî dawetan bûne û di dîwanan da kilamên xwe gotine. Piştî kilamgotinê gundiyan an jî xwedîyê dawetê xelatên dengbêjan dane û dengbêjan bi vî awayî debara xwe kirine. Ew, dengbêjên serbixwe û destûrdayî bûne. Lê hin dengbêj jî karên xwe di bin baskên axa, beg û mîran da kirine. Ew, bûne dengbêjê wê malê û tenê ji bo wan ev kar kirine. Evdalê Zeynikê³ bûye dengbêjê Surmeli Memed Paşa (Aras, 2021, r. 52; Gürür, 2021, r. 103) û Karapetê Xaço ji malbata Filîte Quto ra dengbêjî kirîye (Karacan & Nayman, 2014, r. 372; Kevirbirî, 2005, r. 57-58; Pariltı, 2006, r. 129-130) û gelek stranên lehengîyê li ser Filîte Quto îcra kirîye.

² Bi navê Gula Ermenî, Gula file, Gula keşe tê zanîn. Di sedsala nozdehan da jiyaye. Di derheqê dîroka jidayîkbûn û rehetkirina wê da agahîyên teqez tune. Ew li Elajgirê dengbêja Surmeli Memed Paşa bûye û navê wê bi piranî di leca wê ya digel Evdalê Zeynikê da derbas dibe. Ji bo agahîyên zêdetir bnr. Aras, 2013, r. 44-51; Ömer Seyfudîn, 2023, r. 13-15.

³ Ji bo agahîyên zêdetir ên di derheqê jiyana Evdalê Zeynikê da bnr. Karacan & Başar, 2015, r. 56-69.

Wextekî, jiberkirina kilaman tenê bi rêya guhdarîkirinê çêdibû, lewra divîya dengbêj xwedîyê bîr û dengêkî bihêz bûya. Eger hafîzeyeka baş a dengbêjan tune be nikarin kilaman ji ber bikin û bibêjin. Herçiqas di roja me da êdî bi rêya nivîsê dengbêj dikarin kilaman ji ber bikin jî wextekî ev derfet tune bûye û piranîya dengbêjan jî jixwe xwenda nebûne. Karapêtê Xaço di hevpeyvîneka xwe da dibêje ku “Xwendin û nivîsandina min tune ye lê dema kilamek ji devê yekî derket ew êdî di tûrika min da ye” (Karapêtê Xaço- Dengên Nemir, 2020). Ji gotinên Karapêtê Xaço jî diyar dibe ku dengbêjan piştî guhdarîkirinê kilam ji ber kirine û hin caran guhdarîkirinek tenê jî têra wan kirîye. Herçiqas dengbêj ji alîyê jiberkirinê ve bi hêz bin jî ew ji bo vegotina hîkayetê lez nakin. Ew ji bo hîkayetê melodîyên şexsî dibînin. Dema ku ew vî karî dikin li gor hêvî, xemgînî, daxwaz û xwastekên civakî tevdişînin. “Dengbêj bi hefîzeyê xwe ya xurt ve nêznasê civata xwe ye; ew kevneşopî, erf û adet, rabûn-rûniştin û erdnigariya çandî ya local û giregir, eşîr û malbatên serekî yê civata xwe nas dike” (Delikaya, 2021, r. 157). Bandora civakê li ser dengbêjan bi awayekî aşkera xuya dike. Parry dibêje ku: “Destaneke gelêrî di her îcraya xwe de ji nû ve tê afirandin. Lewra dema îcrayê, konteksta sosyo-çandî û her wiha têkilîya înteraktîf a dengbêj û guhdaran bandorê li ser metnê dike û destan ji nû ve tê afirandin” (Hîkmet, 2016, r. 92). Bi vî awayî guhdêr zêdetir xwe nêzîkê hîkayeta dengbêjî/ê hîs dikin. Lê divê bê gotin ku herçiqas dengbêj di kilaman da hin guherînan çêbikin jî dîsa xezîneya mijar û qalibê ya hîkayetê naguhêre (Pariltî, 2006, r. 115).

Folklorê kurdî bi qasî mêran aîdê jinan e jî. Jin xwedîyê gelek hîkayetên gelêrî û helbestên lîrîk in. Gelek hîkayet û destanên navdar ên wekî Mem û Zîn, Zembîlfiroş, Dimdim ji alîyê jinan ve hatine şirovekirin û gotin (Allison, 2013, r. 250). Di nav kurdan da herçiqas dengbêjên jin hebin jî ew li gor mêran her dem li paş mane. Li gorî Deveci Bozkuş (2011, r. 107) di nav civata kurdan da di dirûvgirtina rola jinê da herçiqas dîne îslamê bandor kiribe jî divê ev rewş tenê bi îslamîyetê ve neyê girêdan. Di paşvemayîna jinê da hin bandorên wekî hebûna rewşeka feodal, polîtîkayên çandî û siyasî yê li ser kurdan hatine meşandin, şerên cîhanê yê yekem û duyem bandor kirine.

Ji bo jinên dengbêj bikaranîna peyva dengbêjê tenê têrê nake û bi bikaranîna “jinên dengbêj” ra jî ev çand tê nêrzakirin. Di binavkirina “jinên dengbêj” da kodên zayenda civakî hene; ji ber ku ya gerdûnî nêrza ye û hewceyî binavkirineka wekî “dengbêjên mêr” tune ye. Di mînakên wekî “jinên nivîskar, jinên pizîşk, jinên avahîsaz” da jî bi heman awayî marjînalîzekirin heye. Lê tê zanîn ku di binyada dengbêjîyê da dengê jinan jî heye û ev deng ji alîyê mêran ve tê vegotin. Sedema wê jî ev e ku jin nikarin derkevin derve û vê performansê îcra bikin. Dîwanên

dengbêjan ên ku tenê mêr beşdar dibûn jî bi vê rewşê ra eleqedar e (Çelik, 2014, r. 644; Özcan Elçi & Cengiz, 2019, r. 978).

Di nav civaka kurdan a berî da dengbêjî bi gelemperî wekî karê mêran hatîye dîtin û bi çavekî nebaş li jinên dengbêj hatîye temaşekirin. Jinên dengbêj dema ku xwastine hunera xwe îcra bikin kilamgotina wan gelek caran wekî eyb, şerm û guneh hatîye dîtin. Lewra jinên dengbêj rastî gelek zextên civakî hatine. Li hember van zextan dîsa jî wan gelek li ber xwe dane û ji karê dengbêjîyê venegerîyane.

Îro rewş hinek guherîye û dengbêjên jin di civat û dîwanên dengbêjan da bi awayekî rehet digel dengbêjên mêr hunera xwe îcra dikin. Bi guherîna şert û mercên serdemê ra hurmeta li hemberî dengbêjên jin zêde bûye û ew êdî bi awayekî hêsantir beşdarî şevbihêrk, dîwan û pîrozbahîyan dibin (Kardaş, 2013, r. 62).

Li jêr em ê li ser çend jinên dengbêj bisekinin ku di jîyana xwe ya hunerî da rastî zextên malbatî û civakî hatine.

3. Di Jîyana Jinên Dengbêj da Bandora Stereotîpên Zayenda Civakî

Dema mirov li jîyana jinên dengbêj dinêre mirov dibîne ku wan hemûyan jî ji ber “jinbûna” xwe gelek zextên malbatî û civakî dîtine. Stran/kilamgotina wan şerm û guneh hatîye dîtin. Cihê sereke yê jinê wekî “mal” e û jina ku ji “mal”ê derketîye jî her wekî “qebheteka mezin” kirîye hatîye dîtin. Di ser da, nabe ku jin stranan bibêje, dengê xwe tomar bike, kaset û CDyan derxe, konsertan bide... Jinên ku van tiştan kirine marûzê nêrîn û gotinên xirab mane. Ew ji civakê hatine vederkirin. Li hember van hemû stereotîpên zayenda civakî, hin jinên dengbêj/stranbêj dîsa jî li pey xeyalên xwe ketine û dev ji hunera xwe bernedane. Herçiqas mecbûr mane ku hin berdêlên giran bidin jî dîsa dev ji xwastekên xwe bernedane. Em ê li jêr bi awayekî kronolojîk li ser jîyan û hunera çend jinên dengbêj bisekinin. Ev dengbêj bi awayekî sistematîk ketoberkî (systematic random) hatine hilbijartin. Me xwest ku mînakên dengbêjên êzdî û misilman tê da hebin. Jîyan û hunera wan dê di çarçoveya stereotîpên zayenda civakî da bên nirxandin.

3.1. Meryem Xan (1904-1949)

Meryem Xan di sala 1904an da li herêma Cizîra Botan li gundê Dêregol (Ömer Seyfudîn, 2023, r. 20) yan jî Dêrgul (Mendes, 2019, r. 73) ji dayik bûye. Ew bi çanda dengbêjîyê mezin dibe û

her dem beşdarî şahî û dawetan dibe. Lê piştî zewaca wê ya li gel Xelîl Înan⁴ rewş diguhere û hevjinê wê, naxwaze Meryem Xan êdî kilaman bibêje. Hevjinê Meryem Xanê ji ber dab û nêrîten civakê û bertekên civakî dixwaze berîya kilamgotina wê bigire. Ew rewş ji bo Meryem Xana ku ji kilamgotinê pir hez dike, zehf giran tê. Meryem Xan mecbûr dimîne ku di navbera zewac û hunerê da tercîhekê bike û ew hunerê hildibijêre. Lê ji bo civaka wê demê hevberdana jin û mêran tîşteki ji rêzê nebû û bi taybetî ji bo jinan rewşeka pir giran bû. Piştî hevberdanê bi çavekî nebaş li jinê dihat nêrîn (Uluç, 2021, r. 41). Meryem Xan piştî hevberdanê berê xwe dide Mûsilê û zêdetir giringîyê dide hunera xwe. Li Mûsilê bi pîlotekî ereb ra dizewice. Meryem Xan bi hevjinê xwe ra jîyaneka bextewar dijî û di wan wextan da dibihîze ku şîrketên muzîkê yên îngilîzan hatine Bexdayê û kilamên kurdî, farisî, erebî, suryankî, ermenî qeyd dikin. Meryem Xan jî dibêje, ez ê biçim Bexdayê û dengê xwe tomar bikim, piştî tomarkirinê dimirim jî bila bimirim (Mendes, 2019, r. 89-90). Ji van gotinên wê jî dîyar dibe ku kilamgotin evîn û xeyala Meryem Xanê ya herî mezin e. Meryem Xan dema diçe Bexdayê li mala keçmama xwe Elmas Xanê dimîne. Mala Elmas Xanê cihê kombûna rewşenbîr, hunermend û siyasetmedaran bûye. Meryem Xan li wir Mihemed Arîf Cizrawî, Hesên Cizrawî, Nesrîn Şerwan, Elî Merdan, Saîd Axayê Cizîrî nas dike û li gel wan kilaman dibêje (Öztürk, 2012, r. 117). Meryem Xan di sala 1935an da di Radyoya Kurdî ya Bexdayê da dest bi kar dike û heta dawîya emrê xwe li wir dixebite (Zal, 2011, r. 192). Meryem Xan yekem jina kurd e ku bi zaravayê kurmançî dengê xwe li ser plakê tomar kirîye (Seyfudîn, 2023, r. 2) û bi navê “Siltana Kurda” di nav gel da navdar bûye.

Meryem Xan jineka bibiryar û jêhatî bûye. Ji bo ku dev ji karê hunerê bernede ji hevjinê xwe vediqete û heta dawîya emrê xwe kilamgotinê didomîne. Stereotîpên zayenda civakî di zewac û kilamgotina wê da xwe didin der. Ew hem ji ber hevberdanê hem jî ji ber kilamgotinê gelek bertekên civakî û malbatî dibîne, mecbûr dimîne û diçe welatekî din dijî, lê dîsa jî dev ji hunera xwe bernade. Gelek berdêlên giran dide lê dîsa jî li pey xeyalên xwe diçe û venagere. Hesreta malbata wê bi taybetî ya dayika wê heta dawîya emrê wê di dilê wê da dimîne.

3.2. Sûsika Simo (1925-1977)

Sûsika Simo di sala 1925an da li herêma Elegezê ji dayik bûye. Navê gundê ku hatîye dinyayê, Mîrekê ye û ev gund jî girêdayê navçeya Axbaranê ye. Ew ji kurdên Qafqasyayê ye û di zaroktîya wê da malbata wê koçî Gumrîyê dike. Sûsika Simo li wir beşa pîzîşkîyê dixwîne û

⁴ Li gor gelek çavkanîyan kesê ku Meryem Xan pê ra dizewice ji malbata Bedirxanîyan e û navê wî Mihemed e. Hevjinê Meryem Xanê ji stranbêjiya wê nerazî bûye û destûr nedaye ku ew kilaman bibêje. Ew rewş bûye sedema veqetîna wan. Bnr. Seyfudîn, 2023, r. 20; Yaş, 2015, r. 121.

nêzikê çar salan di Nexweşxaneyê Bajêr da dixebite. Lê ji ber ku meyla wê zêdetir li ser reqasî û stranbêjîyê bûye karê pizîşkîyê berdide û bi reqs û stranbêjîyê ra eleqedar dibe. Ew di sala 1946an da bi xemla xwe ya kurdewarî derdikeve ser sehneyên ermenîyan û bi kurdî stran dibêje. Sûsika Simo hunermenda kurd a yekemîn e ku li Sovyeta berê li ser dika Şanoya Flarmonya⁵ bi zimanê kurdî stran gotîye. Ew du grûpên reqsê saz dike û bi rêya opera û baleyê hunera xwe pêşkêş dikin. Di heman demê da mamostatîya komên govendê jî dike. Lewra jê ra “Gula Govenda” tê gotin. Berî Sûsika Simo dengbêjeka kurd li ser sehneyên dewletê bi awayekî fermî nehatibû nasîn. Ew di vî warî da bû yekem û wê li ser sehneyên dewletê bi awayekî fermî stran gotin. Wê li seranserê welatê Sowyetê deng dida. Dema di sala 1955an da li Radyoya Êrîvanê Dengxaneyê Kurdî hate vekirin bi dengbêj Gulîzar ra cara ewil li radyoyê stranên xwe tomar kirin (Yaş, 2019, r. 6-7; Seyfudîn, 2023, r. 31-32). Ew tekane jina kurd e ku di Radyoya Êrîvanê da bi awayekî profesyonel dengbêjî kirîye (Deveci Bozkuş, 2011, r. 115).

Sûsika Simo bi xortekî ermenî e bi navê Kolya Naftalyan ra dizewice. Lê ev zewaca wê ji alîyê malbat û derûdorê ve nayê qebûl kirin. Ji ber ku Sûsika Simo jineka êzîdî bû divîyabû bi zilamekî êzîdî ra bizewicîya. Li gor bawerîya wan nedibû ku ew bi kesekî ji millet û oleka din ra bizewicin (Yaş, 2015, r. 337). Bi kesên ji olên din ra zewac bi temamî qedexe bû û ev qedexebûn him ji bo jinan him jî ji bo mêran derbasdar bû. Zewacên bi vî awayî gelek caran bûne sedema cezayên wekî mirinê (Aslan, 2019, r. 63).

Zewaca Sûsika Simo ya bi mêrekî xiristîyan û ermenî ra û wekî jineka kurd xebata wê ya li radyoyê bûn sedemên vederkirina wê ya ji alîyê civakê ve (Deveci Bozkuş, 2011, r. 115). Lê wê bi cesaret, xwendin û hunera xwe, vê zewacê bi wan da qebûl kirin û wekî jineka mînak di nav dengbêjîya kurdan da cih girt.

Sûsika Simo di jîyana xwe ya hunerî da zêde rastî stereotîpên zayenda civakî nehatîye lê di zewaca wê da rewş diguhere û rastî gelek zextên civakî û malbatî tê. Hevjînê wê her dem piştgirîyê dide wê û li ber hunera wê astengî dernaxe. Gelek caran bi hev ra derdikevin ser dikê û bi hev ra stran dibêjin. Bi piştgirîya hevjinê xwe, Sûsika Simo li hember zextên malbatî û civakî li ber xwe dide û heta dawîya emrê xwe zewac û hunera xwe didomîne. Ew bi sekna xwe ya bibiryar û jîyana xwe ya têkoşer ji bo gelek jinên din dibe mînak. Piştgirîya mêrî di dengbêjîya Îran Xanimê da jî xuya dike. Hevjînê wê Seîd Hesenzade di karê wê yê hûnerî da qet astengî çênakirîye û ligel wê çûye radyoyê û heta karê wê qedîyaye li benda wê maye. Seîd

⁵ Ev şano ji bo gelên bindest hatibû texsîskirin û bi vî awayî dikaribûn folklor, huner û çanda xwe li wir pêşkêş bikin. (Mendeş, 2023, r. 32).

Hesenzade guh nedaye rexneyên derdor, êl û eşîrê û li hemberê hunera hevjinê xwe rêzeke taybet nîşan daye (Xakpûr, 2023, r. 33-34).

3.3. Fatma Îsa (1934- 2010)

Fatma Îsa di sala 1934an da li Azerbeycanê, gundê Erezegînê ji dayik bûye. Di emrekî biçûk da dê û bavê wê rehmet dikin û mamê wê li wê û xwişka wê xwedî derdikeve. Fatma Îsa di çardeh salîya xwe da bi kurê xalê xwe yê bi navê Hemzê Sincê Bava ra dizewice lê zarokên wan çênabin. Ji bo zarokan, ji bo paşeroja malbatê, hevjinê wê careka din dizewice. Fatma Îsa ji bo kevneşopîya civakê bi mecbûrî vê rewşê qebûl dike. Tê zanîn ku keç û jinên kurdan girêdayî bav, bira û malbata xwe ne. Heger bav û birayê keçikê wê bide yekî ne mimkun e ku keç pê ra nezewice. Keç bixwaze jî nexwaze jî bi mecbûrî bi wî mirovî ra dizewice. Ev di nav kurdan da adet e û zehf şerm e ku bav û birayên keçikê wê bide yekî û ew jî bêje ez naxwazim (Bayezidî, 2010, r. 147).

Meyla strangotinê li ba Fatma Îsa hêj zarokatîya wê ve hebûye. Di dawet û şahîyan da her dem stran gotine û dengê wê jî gelek hatîye ecibandin. Di salên şestî da berpirsyarên Radyoya Erîvanê tîn gundê Fatma Îsayê û li wê guhdarî dikin. Dengê wê diecibînîn û wê vedixwînin radyoyê. Bi vî awayî di jîyana Fatma Îsa da gava ewîl a dengbêjîya profesyonel tê avêtin. Fatma Îsa li radyoyê kilama “Miho” distrê û dengê wê pir tê ecibandin û dixwazin dengê wê tomar bikin. Ew li radyoyê pênc stranan dibêje û ev stran tîn tomarîkin. Lê ji ber ku jin e kilamgotina wê bi awayekî baş nayê dîtin. Ji bo civaka wê rojê, divê jin di mala xwe da rûne û neçe radyoyê û kilaman nebêje. Fatma Îsa jî careka din naçe radyoyê û li wir kilaman nabêje. Kilamgotina wê bi dawet û şahîyan ve tê sînordarkirin (Yaş, 2016, r. 75-76; Düz, 2011, r. 135-136). Li vir divê bandora radyoyê jî neyê jibîrkirin. Ew ji bo kurdan amûreke nû ye û bi saya wê dengê jinan ji sînore derbas dibe û digehije gelek kesan.

Fatma Îsa yekem û tekane jina kurd a misilman e ku di Radyoya Erîvanê da kilam gotine. Ji ber pergala pederşahî kilamgotina jineka misilman wekî bûyereka şaş hatîye dîtin û pêşî li ber kilamgotina wê ya di radyoyê da hatîye girtin. Fatma Îsa, piştî radyoyê di dawetan da stran û di şînan da jî zêmar gotine û bi vî awayî hunera xwe îcra kirîye (Zaman, 2019, r. 36).

Di jîyana Fatma Îsa da stereotîpên zayenda civakî bi du awayan xuya dibin. Ewîl di emrekî biçûk da bi kurxalê xwe ra dizewice û zarokên wan çênabin. Di nav kurdan da adetekî wisa heye ku eger zarokên jinekê çênebin divê ew jin destûra zewaca mîrê xwe bide. Ev rewş herçiqas ji bo jinekê giran be jî Fatma Îsa mecbûr maye û ev rewş qebûl kirîye. Stereotîpa zayenda civakî ya din a di jîyana Fatma Îsa da bi karê dengbêjîyê ra eleqedar e. Dema xwastine

ku di radyoyê da dengê wê qeyd bikin ewil ji hevjinê wê destûr xwastine. Herçiqas hevjinê wê cara ewil destûr dabe jî piştî bertekên malbatî û civakî Fatma Îsa careka din neçûye radyoyê û kilamên xwe tomar nekirine. Kilamgotina wê ya li radyoyê wekî eyb û şerm hatîye dîtin û rêya wê ya çûyîna radyoyê hatîye girtin. Lewra Fatma Îsa di jîyana xwe da tenê carekê çûye radyoyê û tenê pênc kilamên wê hatine qeydkirin.

3.4. Belga Qado (1934-2004)

Belga Qado di sala 1934an da li gundê Berojê ku li herêma Têlînê ye ji dayik bûye. Malbata wê ji Qersê koç dikin û diçin Kafkasyayê. Navê wê yê rastîn Belgîzer e. Wê jî wekî gelek dengbêjên din ji zaroktîya xwe ve kilam gotîne û meyla wê ya kilamgotinê her dem hebûye. Zêdetir kilamên evînî yên klasîk û yên qehremanîyê gotîne. Belga Qado kilamên xwe li Radyoya Erîvanê qeyd kirîne lê kaset dernexistîye (Polattağ, 2022, r. 105-107).

Stereotîpên zayenda civakî di jîyana Belga Qado da piştî zewaca wê xwe didin der. Wê ji ber zextên gel û hevjinê xwe bi dilekî rehet nekariye biçe radyoyê û kilaman bibêje. Hevjinê wê di girtûgehê da bûye û nexwastîye Belga Qado kilam bibêje û dengê xwe tomar bike. Ew bi awayekî xef diçe radyoyê. Dema ku hevjinê wê çûyîna wê ya radyoyê seh dike ji girtûgehê jê ra name dişîne û bi kuştinê tehdît dike. Ji alîyê din ve, gel bi çavekî nebaş li Belga Qado dinêre. Belga Qado dibêje ku: “Wê xelk bibêje mêrê wê girtî ye, ew jî çûye radyoyê” (Polattağ, 2022, r. 106, 145; Seyfudîn, 2023, r. 29-30). Ewil dudilî dibe lê paşê bi piştgirîya birayê xwe û Sûsika Simo diçe radyoyê û stranan dibêje.

3.5. Zadîna Şekir (1943-2008)

Zadîna Şekir di sala 1943yan da li gundê Poştê ya li navçeya Axbaranê hatîye dinyayê. Ew ji malbateka êzidî ye û hêj di temenekî biçûk da dest bi stranbêjîyê dike. Bi piranî stranên şahî û dawetan dibêje. Di sala 1955an da li Radyoya Erîvanê dest bi dengbêjîyê dike û bi strana “Dêre⁶ Sorê Biçûkê” navdar dibe. Ew di warê hunerê da gelek çalak bûye, li gel Egîdê Cimo di salên 1970yî da orkestrayekê dadimezirîne û di komeka reqasê ya ermenî da jî cih digire. Bi kesekî ermenî ra dizewice û keç û kurekî wan çêdibin (Yaş, 2016, r. 293-294; Deveci Bozkuş, 2011, r. 116). Di jîyana Zadîna Şekir da stereotîpên zayenda civakî hem di dengbêjîya wê da hem jî di zewaca wê ya bi Kamo ra xwe didin der. Kamo yekî ermenî ye û li gor kevneşopîya êzidiyan nabe ku jineka êzidî li gel kesekî ku ol û neteweya wî cuda ra bizewice. Heman rewş di jîyana Sûsika Simo da jî qewimîbû. Sûsika Simo jî êzidî bû û bi kesekî ermenî ra zewicîbû. Zadîna

⁶ Dêr (dêre) di stranê da bi wateya “fistanê” hatîye bikaranîn. “Fistan sorê biçûkê” (Polattağ, 2022, r. 157). Hin kesên ku vê stranê dibêjin wekî Dêra Sorê Piçûkê dibêjin û peyva “dêr” wekî “kîlîse”yê bi kar tînin, ew yek ne rast e.

Şekir piştî zewacê ji alîyê malbat û gelê xwe ve gelek tê rexnekirin lê dîsa jî li hember hemû zehmetîyan li ber xwe dide û dev ji hevjinê xwe bernade. Herçiqas dengbêjîya wê ji alîyê gel ve hatibe rexnekirin û bi çavekî nebaş li vî karî hatibe nêrîn jî dîsa hevjinê wê her dem piştgirîyê dayê û Zadîna Şekir karê xwe yê hunerî îcra kirîye.

3.6. Aslîka Qadir (1945- ...)

Aslîka Qadir di sala 1945an da li gundê Elegezê ji dayik dibe. Ew di sala 1957an da bi malbatî bar dîkin û diçin Rewanê (Alakom, 2023, r. 13). Roja ku ji dayîk dibe stereotîpên zayenda civakî di jîyana wê da xwe didin der. Dê û bavê Aslîkê hêvî dîkin ku kurekî wan çêbe lê dema keçeka wan a din çêdibe pir xemgîn dibin. Dêya Aslîkê, anîna keçekê wekî rûreşîyeka mezin dibîne û qesta jîyana keça xwe dike. Ji hevjinê xwe ra dibêje “Em navika wê nebîrin da ku bimire”. Bavê Aslîkê, ewil daxwaza hevjinê xwe qebûl dike lê paşê poşman dibe û navika keça xwe dibire (Polattağ, 2022, r. 106; Seyfudîn, 2023, r. 89-90). Di sîstema pederşahî da anîna zarokên kur qîmeta jinê zêdetir dike (Kan, 2024, r. 95) çinku bi rêya zarokên kur nesla malbatê dê dewam bike. Li vir di berteka dêya Aslîka Qadir da jî xuya dibe ku civak çiqas giringîyê bi zarokên kur dide û zarokên keç çiqas bê qîmet dibîne. Di roja îro da jî li gelek herêman tê dîtin ku ji bo jineka bêzarok an jî jineka ducanî ra daxwaza zarokekî kur tê kirin. Ji van jinan ra diaya “Xwedê kurekî bide te” yan jî “Xwedê kurê te xweyî bike” tê kirin. Ev rewş jî dide xuyakirin û hebûn an jî saxbûna zarokên kur her dem giring bûye.

Aslîka Qadir li Zanîngeha Erîvanê beşa Zimanê Farisî û Ermenkî dixwîne. Ji ber ku Ermenkîya wê gelek baş e li Erîvanê 22 salan dersên ziman û edebîyata ermenkî dide (Deveci Bozkuş, 2011, r. 125-126). Ew pîspora zimanê ermenî û farisî ye lê zimanê rûsî jî baş dizane. Dema ku Sovyet dikeve Afxanistanê ji bo karê wergêrîyê dixwazin ku ew jî biçe Afxanistanê. Ew di sala 1985an da diçe Afxanistanê û di navbera 1985-1987an da li Afxanistanê ji bo doktorên Sovyetê û Afxanistanê wergera zimanên farisî-darî-rûsî dike (Gültekin, 2017, r. 68-69).

Aslîka Qadir dengbêjîyê ji bavê xwe hîn dibe û bavê wê ji bo kilamgotinê her dem piştgirîyê dide keça xwe. Dema diçe û li Radyoya Erîvanê dengê xwe qeyd dike bavê wê dîsa piştgirîyê dide û li hember Aslîka Qadir nasekine. Bavê wê hin stranan hînî keça xwe dike da ku li radyoyê bistrê (Gültekin, 2017, r. 72-73). Ew bi kilama xwe ya bi navê “Welatê Me Kurdistan e” navdar dibe û di nav bîranînên xwe da behsa serborîya vê kilamê jî dike (Qadir, 2023). Aslîka Qadir li radyoyê ji xeynî kilamgotinê beşdarî hin bernamayan dibe û di şanoyên radyoyê da wekî listikvan dilîze. Aslîka Qadir herçiqas berî zewacê karibûye biçe radyoyê jî piştî zewacê hevjinê wê destûr nedaye. Zewaca wê li ber karê wê yê hunerî bûye asteng. Aslîka Qadir dibêje ku: “Piştî ku zewicîm min bîst sal stran negotin. Piştî ku çûm Ewropayê min dîsa dest bi hunerê

kir” (Polattağ, 2022, r. 106, 145; Seyfudîn, 2023, r. 90-94). Aslîka Qadir di navbera huner û hevjinê xwe da mecbûr dimîne ku tecîhek bike. Ji ber tercîha xwe bi salan ji karê hunerê dûr dikeve.

ENCAM

Stereotîpên civakî hundirê malê dide jinan û derveyê malê jî dide mêran. Dema ku jin daxwaza derve dikin ew çax pirsgirêkên mezin derdikevin holê. Lewra civak di guherînên stereotîpan da hişk e û li ber xwe dide. Jinên dengbêj dema ku xwastine ji sînoren ji bo wan hatine dîyarkirin derbas bin ew çax malbat, civak û hevjinên wan bi sekneka hişk li hemberî wan sekinîne. Li gor stereotîpan nabe ku jinek stran/kilaman bêje, dengê xwe tomar bike, kaset, plak û CDyan derxe, konsertan bide û bibe keseka navdar. Jinên dengbêj jî li hember van stereotîpan sekinîne û “ji mal”ê derketine.

Dema ku mirov li malbat û derdora jinên dengbêj dinêre, dibîne ku ji bo wan stran/kilamgotina jinan eybeka mezin e. Ev rewş ji alîyê malbat û civakê ve wekî rûreşîyekê hatîye dîtin û civakê bi çavekî nebaş li wan nêrîye. Her çiqas malbata hin dengbêjên wekî Aslîka Qadir, Sûsika Simo piştgirî dabin wan jî dîsa ew ji alîyê derdor û xizman ve hatine rexnekirin. Derketina jinê ji malê, strangotina wê, tomarkirina dengê wê, beşdarbûna wê bo çalakî û konsertan bûne sedemên zextên malbatî û civakî ji bo jinan. Jinên dengbêj ji bo hunera xwe berîya zewacê bi malbatê ra, piştî zewacê bi hevjin û malbata hevjinê ra micadele kirine. Di strîna jinan da biryar an di destê malbata wan da yan jî di destê hevjinê wan da bûye. Pîrî caran jinan bê destura wan piştî berdêlên giran karîne stran bibêjin. Ev berdêl hin caran dîrketina ji malbatê ye, hin caran jî marûzbûna nêrîn û gotinên nebaş in. Lê dîsa jî jinên dengbêj ên bibiryar ji bo daxwaz û hêvîyên xwe li ber xwe dane û hunera xwe îcra kirine.

Di xebata xwe da em li ser şeş jinên dengbêj sekinin. Me bi kurtî behsa jîyana wan kir û jîyana wan di çarçoveya stereotîpên zayenda civakî da nirxand. Wekî encam ji bo dengbêjên jin dikare bê gotin ku piranîya wan bi dilekî rehet, bi piştgirîya malbat û hevjinê xwe, bê zextên malbat û civakê karê dengbêjîyê nekirine. Sûsika Simo û Zadîna Şekir ji xeynî dengbêjîyê di zewacên xwe da jî rastî zextên civakî hatine. Ew her du jî êzîdî ne û bi kesên ermenî û xiristîyan ra zewicîne û ev rewş jî ji alîyê malbat û civakê ve tu car nehatîye qebûlkirin. Di dengbêjîya Aslîka Qadir da herçiqas bavê wê piştgirîyê dabe jî piştî zewacê, hevjinê wê destûr nedaye û Aslîka Qadir bîst salan navber daye hunera xwe. Piştî mirina hevjinê xwe karîye dîsa stran bibêje. Belga Qado, herçiqas birayê wê piştgirîyê dabe jî ji ber ku di radyoyê da kilam gotîye ji alîyê hevjinê xwe yê di girtîgehê da hatîye tehdîtîkirin. Fatma Îsa tenê penc kilamên xwe daye

qeydkirin û careka din neçûye radyoyê. Wê piştî demekê, tenê di dawet û şahîyan da kilam gotine. Meryem Xan ji bo hunera xwe mecbûr maye ku ji hevjinê xwe veqete. Ew hem ji bo hevberdanê hem jî ji bo kilamgotinê rastî gelek zextan hatîye û bi mecbûrî çûye welatekî din.

Tê dîtîn ku her şeş dengbêjan jî di astên cuda da, ji bo hunera xwe li hember stereotîpên civakî li ber xwe dane û di şertên gelek dijwar da kilamên xwe gotine û jîyane. Ji bo van jinên dengbêj wekî taybetmendîyeka hevpar dikare bê gotin ku hemû jî li hember nêrînên nebaş ên civakê li ber xwe dane û di rewşên dijwar da kilamên xwe gotine. Berxwedana wan ji bo parastina mîrateya çandî gelekî giring e. Lewre em dikarin bibêjin ku ev lêkolîn him ji bo xebatên zayenda civakî him jî ji bo çanda devkî ya kurdî sûdewar e.

ÇAVKANÎ

Alakom, R. (2023). Bîranînên Aslîka Qadir. *Nûbihar*, 27(165), 10-13.

Allison, C. (2013). *Folklor ve fantezi: Kürt sözlü geleneğinde kadınların sunumu*. Di nav S. Mojab (Ed.). *Devletsiz ulusun kadınları- Kürt kadını üzerine bazı araştırmalar* (245-263). Avesta.

Aras, A. (2013). *Şairê kurda yê efsanevî Evdalê Zeynikê*. AKYAD Ağrı Kültür ve Dayanışma Derneği.

Aslan, M. A. (2019). *Tarihten günümüze Yezidilik/Êzîdilik ve Viranşehir Yezidiliği/Êzîdiliği*. (YÖK Tez Merkezi, Yüksek Lisans Tezi). Harran Üniversitesi.

Bayezidî, M. M. (2010). *Adat û rusûmatnameê ekradiye*. Nûbihar.

Bhasin, K. (2015). *Toplumsal cinsiyet “bize yüklenen roller”* (wer. K. Ay). Kadın Dayanışma Vakfı Yayınları.

Bingöl, O. (2014). Toplumsal cinsiyet olgusu ve Türkiye’de kadınlık. *KMÜ Sosyal ve Ekonomik Araştırmalar Dergisi*, 16(1), 108-114.

Çakmak, S. (2024). Post-Yapısalcı bir yaklaşımın yapı sökümü kadın dengbêjler ve anlatıları. *Uygulamalı Sosyal Bilimler ve Güzel Sanatlar Dergisi (SOSGÜZ)*, 6(15), 57-80.

Çelik, D. (2014). *Dengbêjliğin erilliği ve küçük kadın dengbêjler*. Di nav B. Talay Keşoğlu, L. Şimşek Rathke (Ed.). *Kadın hayatlarını yazmak: Oto/Biyografi, yaşam anlatıları, mitler ve tarih yazımı uluslararası sempozyum bildirisi kitabı* (641-647). Kadın Eserleri Kütüphanesi ve Bilgi Merkezi Vakfı.

- Çetin, A. (2017). *Türk Sinemasında Yoksulluk Temsilleri: 1960-1975 Dönemi*. (YÖK Tez Merkezi, Doktora). Mersin Üniversitesi.
- Çetin, A. (2020). Kadına yönelik şiddetin kaynağına dair lacanyen bir değerlendirme. *Şarkiyat*, 12 (4), 1137-1146. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.827992>
- Çetin, A. & Kaplan, L. (2025). Mardin Artuklu Üniversitesi Türkçe ve Arapça sosyoloji bölümü öğrencilerinin toplumsal cinsiyet algıları: Karşılaştırmalı bir araştırma. *PESA Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, 11(1), 51-73.
- Delikaya, Ö. (2021). *Venavandina cihûwaran li komara Tirkiyeyê: mînaka Agiriyê*. (Navenda YÖK Tezê, Doktora). Zaningeha Çewlîgê.
- Delikaya, Ö. & Ertekin, M. Z. (2021). Li geliyê Çatê tav diziriqî: Topogeny û nexşeya devkî di kilama Elî Xarza de. *Kurdiyat*, (3), 11-25.
- Delikaya, Ö. (2025). Şair, dengbêj, sazband û aşiq: Nêrînek li termînolojiya îcrakarên edebiyata kurdî ya devkî. *Mukaddime*, 16(1), 231-261. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.1515868>
- Deveci Bozkuş, Y. (2011). *Kürt toplumunda kadın dengbêjler*. Di nav N. Mora (Ed.). *Kültürlerarası iletişim bağlamında insana dair duygular ve ritüeller* (99-130). Nobel Akademik Yayıncılık.
- Düz, F. T. (2011). Bir stran bir ömür. *Kovara Qijika Reş* (3), 135-136.
- Elçi, D. Ö. & Cengiz, G. (2019). *Literatürde kadın dengbêjlerin yeri ve tartışma biçimleri. Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler Sempozyum Bildirileri* (971-984). Şırnak Üniversitesi Yayınları.
- Filiz, M. Ş. (2023). *Roman diliyle kürtler marksizm, milliyetçilik ve feminizm bağlamında üç özgürlük anlatısı*. Peywend.
- Fine, C. (2011). *Toplumsal cinsiyet yanılsaması*. Sel Yayınları.
- Görücü Öner, S. (2021). *Hatice Meryem'in hikâye ve romanlarında toplumsal cinsiyet rollerinin incelenmesi*. (YÖK Tez Merkezi, Yüksek Lisans Tezi). İstanbul Aydın Üniversitesi.
- Gültekin, N. (2017). Rojhilatzan, hunermend Aslıka Qadir: Asûrîyan jî ermenîyan jî şayî û şînen xwe bi stranên kurdî kirine. *Nûbihar*, 21(141), 66-73.
- Gürür, Z. (2021). *Dengbêjî di pêywenda patronajê de*. Weşanên Pêwend.
- Hîkmet, B. (2016). *Teorîyên fêklorê*. Lîs.

- Kan, G. (2024). Li dor zayend û netewe(tî)yê jina kurd di berhemên Elîyê Evdilrehmanî da. *Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi DÜSBED*, (37), 89-11. <https://doi.org/10.15182/diclesosbed.1486817>
- Kaplan, L. (2024). Bandorên stereotîpên zayenda civakî li ser pêkanîna kevneşopiya dengbêjiyê: Mînaka Eyşe Şan. *Mukaddime*, 15(2), 502-522. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.1490407>
- Karacan, H. & Nayman, R. (2014). Dengbêj Salihê Qubînî ile Karapêtê Xaço'nun şarkılarında aşiret kavgaları: "Filîte Quto ile Elî Etbankî kavgası". *Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, 16(2), 361- 388.
- Karacan, H. & Başar, R. (2015). Di kilamên Evdalê Zeynikê de "hezkirina jiyanê û daxwaza mirinê". *International Journal of Kurdish Studies*, 1(2), 56-69.
- Karapêtê Xaço- Dengên Nemir. (2020). <https://www.youtube.com/watch?v=-vBbXGNethY> (20.11.2023).
- Kardaş, C. (2013). *Dengbêjlik geleneği ve âşık edebiyatı ile karşılaştırılması*. (YÖK Tez Merkezi, Doktora). Fırat Üniversitesi.
- Keleş, B. (2019). *Dengbêjliğin tarihi süreç içerisinde ortaya çıkışı ve değişimi*. *Uluslararası dengbêjlik kültürü ve dengbêjler sempozyum bildirileri* (383-395). Şırnak Üniversitesi Yayınları.
- Keskin, N. (2016). Di çarçoveya performansê de nirxandina vegotinên gelêrî. *International Journal of Kurdish Studies*, 2(1), 51-66.
- Kevirbirî, S. (2005). *Bir çîglîğin yüzyılı Karapêtê Xaço*. Elma. Köşgeroğlu, N. (2010). *Toplumsal cinsiyet ekseninde kadın/ kalın duvar ince zar*. Alter Yayıncılık.
- Mendeş, H. B. (2019). *Meryem Xan hayatı, sanatı ve şarkıları*. Avesta.
- Oğuz, A. (2019). *Feminizm, postkolonyal feminizm ve toplumsal cinsiyet*. Çizgi Kitabevi.
- Öztürk, S. (2012). *Kadın kimliği bağlamında kültürel bellek ve Van merkezdeki kadın dengbêjliği yansımaları*. (YÖK Tez Merkezi, Yüksek Lisans). İstanbul Teknik Üniversitesi.
- Parıltı, A. (2006). *Dengbêjler sözün yazgısı*. İthaki.
- Pilpil Yöney, G. (2013). İspanyolca'da dilsel ve toplumsal cinsiyetçilik analizi. *Dil Dergisi*, (161), 50-71.

- Polattağ, H. (2022). *Dengbêjên jin yên radyoya erîvanê*. (Navenda YÖK Tezê, Lîsansa Bilind). Mardin Artuklu Üniversitesi.
- Qadir, A. (2023). *Jiyan û bîranîn-welatê me kurdistan e*. Avesta.
- Seyfudîn, N. O. (2023). *Hunermend û dengbêjên jin “têrîjên vejînê”*. Na Yayınları.
- Suvağci, İ. (2021). Zayenda civakî di loriyên kurdî da. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 9(3), 763-770. <https://doi.org/10.18506/anemon.819298>
- Yaşın Dökmen, Z. (2021). *Toplumsal cinsiyet*. Remzi Kitabevi.
- Uluç, M. (2021). *Meryem xan dengbêja hizin û kederê*. Pêywend.
- Uzun, M. (2017). *Dengbêjlerim*. İthaki.
- Xakpûr, S. (2023). *Îran xanim hawarek ji Urmiyeyê*. Nûbihar.
- Yaş, Z. (2015). *Şakarên muzîka kurdî* cild 1. Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê.
- Yaş, Z. (2016). *Şakarên muzîka kurdî* cild 2. Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê.
- Yaş, Z. (2019). Berê radyoya Erîvanê Sûsika Simo hebû. *Dilop*, 2(9), 6-7.
- Yıldırımçakar, M. (2020). Dengbêjiya jinê ji hêla patronaj, perwerdehî, rol û nêrîna civakî û îcrakirina hunerê ve. *Kurdîname*, (2), 87-96.
- Zal, A. (2011). *Antolojîya dengbêjan 2*. Şaredarîya Bajarê Mezin a Dîyarbekirê.
- Zaman, R. (2019). *Bir direniş hikayesi: dengbêj û stranbêj olarak Eyşe Şan*. (Navenda YÖK Tezê, Lîsansa Bilind). İstanbul Bilgi Üniversitesi.